Erich Fried

43 helbestên bijare

bi wergerandin, pêşgotin û şiroveyên

Tengezarê Marînî

tengezar.marini@freenet.de

Peyvek

Guman tê de nîne, ko rola wergerandinê roleke mezin bo nasîna felesefe, çand, Zanist û hemî cureyên jiyanê heye, lewra welatên pêşketî giraniyek dane vî karê pîroz. Û eger em Japon wek nimûne bigirin, em ê bizanin ko rola wergerandinê nemaze piştî şerê cîhanê yê diwem, di pêşketina teknîk, zanist û xweşiya jiyana xelkê Japonê de roleke mezin e.

Rast e, rewşa kurdan beramberî rewşa tu miletên din nabe, lê jibîr nabê jî ko kurd ji wan miletên pêşî bûn, ko derketibûn derveyî welêt (ji xwe sedem diyar in) û pêdivî bû rewşenbîrên me roleke mezintir di warê wegerandinê de bilîsta. Zimanê kurdî zimanekî fleksîbil û nerme, dikare zû di gel zimanên din (bi taybetî yên Hindo-Europî) bigunce û sûde ji wan webigire. Pêdiviya wergerandina bo zimanê kurdî ji wê tê, çimkî zimanê me hewqas sal hatiye qedexekirin û kar kêm li ser hatiye kirin û pêwîst bû têkeve nav liv û tevgerê.

Vêca erkekî qurs û mezin li ser şanê rewşenbîrên kurd e, yên li derveyî welêt in, ko ji makderên orîgînal pirtûkan wergerînin û niha ew derfet heye, tenê vîn, daxwazî, cegerdarî û piçek qurbandanî pêdiviye.

Li ser vê berhevokê ko min ji zimanê Elmanî bo kurdî wergerandiye, ez dişêm van peyvan bibêjim:

1 - Min hez ji helbestên vî helbestvanî kir, ji ber ko bi zimanekî hêsanî şiya hewqas, hest, nest û mirovayetî derbibire.

2 – Erich Fried ji destpêka xwe de jiyanek nexweş, koçberî, û sêwîtî (Bavê wî di sala 1938an de ji hêla Naziyan hatibû kuştin, ji ber ko cuhû bû) derbaskir.

3 – Tevî hewqas teda, zulim û corê jî Erich Fried, mirovahiya xwe winda nekir, evîna wî ji helbestê re bêsinor bû û Evîn sernîşana peyva wî bû, dilê wî rê neda dexz û kînê, ko hêlînên xwe li nav çêbikin.

Helbestên min hilbijartine, ji gelek pirtûk û malperên Internêtê ne û li min li jêr her qeftek helbest, min cihê ew helbest ji wergirtine destnîşan kirine.

Li vir û ji bo rastnivîsê, spasdarê nivîskar û romannivîsê kurd , Ibrahîm Seydo Aydogan im, ko dema xwe bo rastnivîsîna vê wergerê terxan kir û dixwazim bibêjim ko ev wek pirtûk jî wê li Kurdistanê bête çapkirin, di gel gotara birêz nivîskar û wegerê hêja Mustefa Aydogan, ya ko di malpera Nefelê de hatibû weşandin, lê li vir min ew gotar di gel vê berhevokê dernexist çimkî di malpera Nefelê de heye û li wir xwênerên hêja dikarin bixwînin û lê vegerin.

Tengezarê Marînî

Erich Fried (1921-1988)
Helbestvan û wergêrê Austuriyayê

Di 6ê Gulana sala1921ê de, li Wiyanaya ku paytextê Austuriyayê ye, ji dê bavên Cihû ji dayîk bûye.
Di sala 1938an de, bavê wî ji hêla Naziyan (Gestapo) ve hatiye koştin, ew ji ber wan reviya û çû li Londonê bi cih bû.
Di sala 1944an de, dîwana xwe ya bi navê „Elmaniya „ bi zimanê elmanî çap kir û di sala 1945an de, dîwana bi navê (Östreich = Austuriya) bi zimanê Elmanî weşand.

Di navbera salên 1952-1968an de di Radiyo ya BBCyê de kar kir û di wê navberê de, gelek helbest û pirtûk weşandin.

1958 Helbest
1963 Dewlemendiya Keviran
1964 Helbestên Hayedar

Di dema şerê Emerîka û Viyêtnamê de, wek rexnegirekî civakî xebata xwe berdewam kir û vê bûyerê kartêkirineke mezin li nivîsên wî kir.
Kartêkirina vê buyerê di çend berhemên wî yên wek mînak li jêrê hatine dayin de diyar in:

1966 Viyêtnam
1972 Danehev (Azadî û dev vekin)
1973 Guh bide Israêlê „ ev pirtûk di sala 1983an de ferehtir kir“
1974 Jehirdij
Vê buyerê (şerê Viyêtnamê) bandora xwe li helbestên wî yên evîndariyê jî kiribûn, yên ko bi wan nav û dengê wî li tevaya Europa û Emerîkayê belav bûbûn.

1979 Helbestên Evîndariyê (bi vê pirtûk a helbestî, nav û dengê wî belav bû)
1986 Gewrebûna Rizgarvan
1987 Li ber kenarê Jînê.

E.Fried, ne tenê helbest nivîsîne, belê wî çîrok û roman jî nivîsîne û wek wergêrekî çeleng û zîrek dihate pejirandin.

1960 Leşker û Keçik (Roman)
1965 Zarok û ehmeqan didin hev (Çîrok)
1975 Gişt hemî Guman in (Çîrok) .

Erich Fried ji sala 1958an ve, rêbaza xwe ya taybet di nîvîsînê de bi dest xist. Fried, ziman distireha û bêyî ko zimanê xwe zor û aloz bikiraya bi peyvan dilîst,. Wî bi zimanê hêsanî, zimanê rojane, nivîsên xwe ên pirdeng û pirwate radixistin ser kaxezê. Fried yek ji wan nivîskaran e, ko ji pend, metelok û peyvên bav û bapîran sûde wergirtine û ew bo bihêzkirina deqên xwe bi kar anîne û giyanê helbestên xwe û herweha ê xwênerên xwe jî vejandine û jîndar kirine.

Ji ber ku wî hewil dabû ew deq û toraya Ingilîzî ya bilind wergerandaya zimanê elmanî, ew di ware wergerandinê de jî bi nav û deng bûbû.
Fried, nivîs û berhemên Dylan Thomas, T.S. Eliot, Graham Green û Shakespeare, bi zimanekî bi hêz, resen û hevgirtî wergerandin.

1986 xelata Carl-von-Ossietzky a grûpa navnetwî a mafê mirovan wergirt.
1988 xelata Georg-Büchner wergirt.

Di roja 22.11.1988an de, li Baden-Baden derbasî xewa xwe ya ebedî bû, lê helbest û deqên wî di nav rewşenbîr û heztoriya zimanê elmanî de, cihekî taybet digirin.

Ernst Jandl
li ser
Erich Fried

Erich Fried zarokatî û tolaziya xwe mîna min, li Wiyanayê buhurandin.
Me bi vî bajarî bi tenê re tiştekî hevpişk hebû.
Lê wî çawa dîtibû çawa buhurandibû, ji min ve nediyar e!
Sala 1938an, temenê Erich 17 bû û ê min 13 bû, wî rev dabû ber çavên xwe û rev wek babet bo wî rêka xelasiyê bû, lê ez qet bi revê û derketinê neramiyabûm.

Cara yekem ko ez û Erich pêrgî hev bûn, sala 1952an bû, li Londonê, ew 31 salî bû û ez 27 salî bûm.
Ew û ez, di yek baweriyê de bûn, ko rewşa hunera helbestê li Awisturyayê ne baş bû, bi wateyeke din, gilî û gazindên me jê hebûn.
Em herdû hatibûn vexwendin, da em li ser rewşa helbestê ya Awisturyayê bipeyiviyana û me agahî bidana. Yê em bi hev dane naskirin Andreas Okopenko bû.

Ez salekê li Londonê mam, lê me hevdu pir nedidît, carnan ji nişka ve em pêrgî hev dibûn û me silav li ser piyan dida hev. Demeke dirêj pê ve çû, ta me bi cînavka **TU** gazî hev dikir.
(„Di zimanê elmanî de, cînavê Du= Tu, tenê di nav heval û hogirên nêzîk de bi kar tê û Sie= „cenabê we“ bo rêzgirtin û kesên hev nenasin e“)

Erich Fried, bi dengê xwe yê qebe û bihêz, rêya xwe ya pîroz bi mirovahiyê da pejirandin.
Dibêjin, ko di vehesîna wî ya ezelî de sê peyv, sê kar û sê zarave hogir û hevrêyên hev in:

Fried.
Azadî.
Evîn.

Erich Fried

1.Dilê Rastiyê.

Mîna ko gotibe:
<< Bêhna xwe teng neke,
ji bo tu min sar bikî>>
lê
bêhntengî ye,
a li derdora
wê,
wî
we
mîna ko gotibe

2. Pirs

Aya ez te tînim bîra xwe,
an jî wan koşeyên te,
ên ku dixwazim maç bikim
û pêsîrên te
ên wisa şaş
mîna pirsê?

gelo hizra te bikim
An jî hizra çavên te ên bel
ên ku dixwazim ramîsim
Û
pora te bînim bîra xwe ?

3. Azadiya Desthilatdariyê

Eger bête gotin :
« Li vir
azadî serdest e»
bizanin ku
şaşiyek e
an jî
derew e:

4.Pirs

Çiqas dirêj e jîna te?
Çendî kûr e?
Buhayê wê bo te çend e?
Ta kengî tu dê buhayê wê bidî?
Çend dergehên wê hene?
Çend caran te nû dest bi jiyana xwe kir ?
Ma te çi caran
Pêdivî nedît, wê bibezîne?
Eger tu got **A,**
tu li çarmedorê wê geriyayî,
bi bazinî, an jî bi tengaviyê,
te pê re bazda?

Te çi hizir dikir?
Te çawa dizanî,
Ko tu li dora wê bûyî?
Tu pir caran direviyayî?
Cara siyan wek ya diwan bû?
Bo te baştir bû,
eger te ew rê bi tirimbêlê birrîbûya?
An jî dixwazî bi hêleke din ve herî?
Di gel kê?

5. Axaftin

Di gel mirovan
Li ser aştiyê bipeyivin
Û
pê re hizra xwe bikin
Ji paşerojê bipeyivin
Û
pê re hizra xwe bikin
Ji maf û jiyanê bipeyivin
Û
pê re hizra xwe bikin
Ji tirsa
Li ser mirovên bi xwe re
Û
pêre hizra xwe bikin
Nîfaq e,
an jî di dawî de
Rastî ye ?

6. Helbestxwendin

kî hêviya xelasiyê
ji helbestekê bike,
ya baştir ew e ku ji dêleva wê
xwe fêrî xwendina
helbestê
bike.

kî hêviya nexelasiyê
ji helbestekê bike,
ya baştir ew e ku ji dêleva wê
xwe fêrî xwendina
helbestê
bike.

7.Jêbir

yek hizrê ji me werdigire
bes e bi tinê ko
em nivîsên wî bixwînin
û carnan di gel xilmaş bibin

yek pêjinkirinê ji me distînê
helbestên wî
xelatan werdigirin
û
pir caran dibin wek nimûne
yek biryardanên giring distînê
li ser ceng û aştiyê
û em tim wî hildibijêrin
pêdivî ye bi tinê
sûnd
bi deh ta duwanzdeh navan bête xwarin
êdî ew ê
hemî jiyanê
ji me
bistînin.

8. Dubare

Çi tiştê kesî bawerî pê neaniyaya
Çi tiştê kesî nezaniye
Çi tiştê fermana hayedariyê
Nedaya.
Ew,
wê,
wî
êdî dubare ye
Ew hebûn bû
Çi tiştê kesî nedixwest
bixwestaya.

9. Tu dema Evîndar î

min li mirovekî
guh pêl dikirin
çawa ko dibawişkî
„ dema tu evîndar bî“
Çi wate ye
“ dema tu evîndar bî”?
« Dema tu evîndar »
giring e watedar be
« dema evîndariyê”!
ji nedemê bi me re ye
pêwîst e bijîn û dîsa..
ew dema me
a bi tinê ye
dema jiyana me
û dema
em ji jînê hez dikin
em neşên bê evîn
li dijî
dema xwe rawestin
pêdivî ye em wê
wisa nehêlin,
wekî ko pêrgî
me
bûbe.

10. Dûrî

dibê li nêzîkbûnê
mirov helbestan nenivîsîne
dikare destan
dirêj bike
bigire
biperxîne
dengên hev bibihîzin
dêmên wan bihingivin hev,
lê nayête pesindanê,
ka çawa
evîn mezin dibe,
tiştên ku dinivîsim
serbûriyên mirovan e
bi şev û rojan
li nêzîkbûnê jî

11. Tu

devera azadî lê nebe
tu azadî yî
devera şeref lê nebe
tu şeref î
devera germahî lê nebe,
nêzîkahî di nêv mirovan de nebe,
tu
nêzîkahî
û
germahî yî

Tu..
Gerdûna bêdil î
Lêvên te,
zimanê te
pirs û bersiv in.
di himbêza te de,
di nav paxilên te de,
tiştekî wek vehisînê heye,
her careke pêdivî be,
ji te dûr bibim,
dîsan xwesteka
vegerê peyda
dibe.

Tu..
Destpêka paşerojê yî,
Dilê oqyanos a bêdil î
Tu
ne li benda baweriyê yî
ne felsefe
ne fêrker
û
ne jî malxwê yî,
ên ko mirov
xwe pê ve girê bide
Tu
miroveke jîndar î

Tu
jin î
Tu dikarî
Şaş bibî,
gumanan bikî
û
çak bî

dilê cîhana
bêdilî
Tu.

12. Xewneroj

Ez wisa westiya me,
Êdî
dema tî dibim,
Bi çavên girtî
Dê Piyalê xûz dikim
Û
vedixwim
Dema
çavan bel bikim
ew ne li wir in
û ez westiya me
bo biçim
û
çayê
bikelênim

Ez wilo hişyar im
bo te
maç bikim
û
te biperxênim,
bo dengê te bikim
û
piştî her gepekê,
bi te re bipeyivim
û ez hişyar im,
bo çavan vekim
û bixwazim
te bibînim
û bibînim
gava ku tu
ne
li
vir be

Ev helbestên jêr ji pirtûka E.Fried ya bi navê *Um Klarheit, Gedichte gegen das Vergessen= bo diyarkirinê, helbest li dijî jibîrkirinê* ji Weşanxana Klaus Wagenbach Berlin çapa nû sala 1998.

13.Demhijmêra spêdê

Min bi şevê gotibû:
carnan mêranî jî kêm e
ko bi rastî
cengê
ji bo cîhanê
û
jiyanê
bikin
lê spêda din
em hişyar dibin
û
<<ji şeva buhurî
hêzê werdigirin>>
bi
hişyarbûnê re
di spêda din de
min gotibû:
<<Ez dixwazim
bimirim>>

14. Judith

dema...
berê xwe dabûne wê
û wan ew
mîna siwarekê bi nav kiribû
û hemî mêran
şahnazî pê dikir
ew
girnijî
û nediviya bianiyaya bîra xwe,
ko ev a mirî,
ew bû ya ku ji berê de nas dikir
an na?

Ji wê şevê ve
min xewin pê didîtin
û min
ew himbêz kiribû
û bi kotekî pê kiribû
Ji serhişkiya
Mêran e.

15. Awardar

Eger xelk bibêjin te
<< pir xeman nexwe>>
pişt re
li wê xelkê
temaşe bike,
ew dê bêjine te:
- wan binase
wek
ko weha bûbe,
ko mirov
pir agah
li xwe
nebe.

16. Jihevxistin

Ew
evîndarê jiyanê ne
Pir dibêjin
Ew
hez ji jinekê dikin
An himbêza wê
An dengê wê
An
hez ji wê bêhna xweş
a ku ji nanê wê ê nûçêkirî,
difûre dikin
an xaniyekî kevin
an roka
li ber ava

Wateya vê evîn e
pir caran
û tim jî
Ko
hez ji jiyanê dikin

Ew in ên
hez ji jiyanê nakin
lê bi tenê
Ramana hezkirina jiyanê
bilind radikin

Ew hez ji jiyanê dikin
mezinahiya siruştê
û mirovahiya ko
bibe malxweyê xwe.
Da ko
vê evînê bixwazin,
ew ê kesên ko
hez ji jiyanê kiribin
bikujin.

17. Wekhevî

Pisîk
û
mişk
herdû nikarin
rêkê bidin
mişkgirtinê
Lê
mişkgirtina mişkî
ne mîna
mişkgirtina
pisîkê ye.

18.Jîndar

Ez
Penaberek bûm
di
welatekî din de

Tu
nexweş bûyî
û kesî tu
wernedigirtî

Ew
bextewar bû
û
birîna wê
sivik bû

Destdirêjî
li wê hatibû kirin
bêyî ko nîşana encameke
xerab
lê xuyabe

ew
wê demê
ji kokê ve
ne li ser
hewata dinyayê bû
û
pêdivî ye
em
hun
û
ew
careke din jî
bimirin

19. Bi salan re

Bi serbûriyekê
çelengiya min
gewre
dibe.
Ji bo
Pesindayinê
çi tişt
nema ye ko
bipesinênim

20. Hewldan

Min
hewl dabû
ko
hewldanan bikim
di wê demê de
pêdivî bû
min karin bikiraya
ji bo ku
min karê xwe bianiyaya bîra xwe
û ne ji bo te
û ez
kêxweş im
ji bo hewildan
kêxweş
nebe.

21. Sê Pirs

Eger evîn
nema bikare
bêhtir bimîne
gelo bi rastî jî
nema
dimîne?

Eger evîn
dest ji xwe
berde
ko
dawiyê li xwe bîne
gelo
ew
evîn
e?

Lê
eger evîn
nikaribe
dawiyê li xwe bîne
bi rastî jî dikare
dawiyê li xwe bîne?

22. Qedirgirtina Toreyê

gelo heye
demekê
piştî
xwekuştinê,
heyberên lerzok
ne tenê
mîna helbesteke
şensdar
belkî jî
mîna guman
bête
nasîn !?

23. Li dijî Jibîrkirinê

Dixwazim bîr bikim
ko naxwazim
ji bîr bikim
edî dixwazim
ez, ez bimînim
da ko
bixwazim
ji bîr bikim
êdî bo nema
van xeman bikêşim

***

Dixwazim bînim bîra xwe
ko naxwazim
ji bîr bikim
da ko
bixwazim
ji bîr bikim
êdî dixwazim
xwe binasim.

***

Ez neşêm biramim,
bê ko bînim bîra xwe,
nikarim bixwazim,
bê ko bîr bibim
êdî nikarim hez bikim
êdî neşêm hêviyan bikim
êdî nikarim
ji bîr bikim
bêyî ko
bîr li xwe bikim

***

Divêm bînim bîra xwe
hemî tiştê ko
mirov ji bîr dike
êdî nema
dikarim azad
bibim
bêyî ko
li bîra xwe vegerim,
ne xwe
û ne zarokên xwe jî

***

dixwazim bîra
pêşeroj
û
paşerojê
bikim
û divêm bînim
bîra xwe
mîna ku nêzîkahî pêwîst be
ji bîr bikim
û
divêm
bînim bîra xwe
ko
jibîrkirin
nêzîk bibe

***

24-Kujer

Ew Rast e
Ên duh lêdan
Li wan hatibû kirin
Ên ko weke dijmin hatibûn destnîşankirin
Û mirî ne
Û nema dikarin kuştinê bikin
Û nema rê xweş dikin
Da ku kujer biafirin.
Hew êdî tirs heye
Desthilat ji dest wan û
Û yên bêlêdan
Ji îro û sibe mayîn û
ên wek heval dihatin hejmartin
û kuştin pêk dianîn
û haziriya kuştinê dikin.
Ew nerast e,
ku em wan bi kujer li qelem bidin
ew bi xwe tirs e ji ber ku ew
seredest in

25- Labîrenta toreyê

ew ê
ku li dijî
her hêlekê be?
çawa dikare
ji nişka ve
kêfa xwe ji
qonaxekê re bîne?

26-Rêzgirtin

Demekê,
piştî xwekuştinê
dibe ko deqên wê
ên bi guman
ne mîna
bextewar û taybet bin,
lê belkî wek gumanê
bêne nasîn?!

27-Li dijî Keviravêtinê

Min
Aştî ava nekiriye.
Ceng
û
aştî
bi wan re
ên
planên cengê saz dikin
nekiriye

Ew jî
Destê wan li ser
Nîvê cîhanê ye,
ya wan e
plana şer saz dikin,
tenê bo ku
ew şer bi rê ve nebin.
Bo min
Ew pîstir in
Ji wan ên
Pîsiyê segan,
Li ser kolanan
Bi wan tê avêtin.
Dêmên wan
Bêbiha ne
û,
Kevir jî
Pak nabin.
Dihingivin yêkî din
Pîlaneke din
Bo şerekî nû
Nîgar dikin.

28-Reşbîn

ez li
oqyanosê
siwar dibim
oqyanos.
Hespekî girs e
Pir girs e
Ko min bikariya jê daketaya!

oqyanos.
Hespekî girs e
Û
Beza ye
Belkî
Şermok be
Min bihîstiye
Ko dixwaze
Niha bimire
Ez nizanim,
dê bikaribe
tu û nehêlî bibeze?!

29- Keştiyeke nû, an jî derûnekî nû (Nezanî)

ew wisa
bêalî bûya,
êdî ew
li mafedanê ne,
an jî
li sêdaredanê ne,
an jî
li fêlbaziyê
ji hêlên din tên.

Û
Eger ne “NÛ »
Bihataya binavkirin
Edî rastî wisa kevin e
Mîna hemî
Rastî
Û
Derewan.

30-Veşartin

Xwe veneşêrin,
Ji ber ku
Diyardeyên demê,
Di evînê de

Lê xwe
Ji ber
Evînê,
Di diyardeyên
Demê de
Jî.

31-Sensor

Ew ên
Pirbêj
Ew,
Hinekî têr in.
Ta
Kesera dawî
Ez
Têrr iiim
Lê
qet ne
Hetanî
Bi hilma
Dawîîîî

Ji Pirtûka Erich Fried ya bi navê „ Liebesgedichte „ „ Helbestên Evînê“ Berlîn 1998.

32- Tu

Tu kî yî bo min ?
Tiliyên te çi ne bo min ?
Û lêvên te ?
Çingîna dengê te?
Hilma te çi dide min
Berya em hevdu himbêz bikin
Û bêhna te,
dema em hevdu himbêz dikin û
piştî himbêzkirinê?
Tu bo çi yî?
Ez bo te çi me?
Ez çi me?

33- Lê

ji awira yekê, ez dilketime
roniya ji nava çavên te diberiqin
ji wî kenê te bo kêfa jiyanê.

Niha ez hez
Ji giriyê te jî dikim
U ji metirsiyan te ji jiyanê
U ji wê bêomediya
di nav çavên te de.

Lê li dijî tirsê
Dikarim alîkariyê bi te re bikim,
ji ber xweşiya min
herdem û hîn jî
biriqandina çavên te ye.

34- Xatirxwestin

Tiştê baş
Niha difire
Devera ku ne herdem
Hemî derbasî
Dema bihurî dibe,
Lê her roj derdikeve
Mîna çûna hetavê
Bo rojava

35- Tirs û Guman

gumanê neke
ji tişte ku
ew bibêje te,
ku ew ditirse

belê bitirse
ji ya ku li ser tête gotin
ew bêgumaniyê nas nake.

36- Nabe

pêdivî ye
ku palgehê xwe maçî bikim,
ew ê ku te serê xwe li ser danîbû.

Pêdivî ye
Ku tiblên xwe ramîsim
yên ku buhayê
evîna te baş dizanin.
Pêdivî ye
Ku zimanê xwe ramîsim,
Lê ez nikarim

37- Tiştê baş

dema diniherim,
ka çi ji tiştê baş re
tê xwestin û kirin,
êdî carnan diramim,
ko ew ê baştir bibûya
belkî
ji kokê ve
tiştê baş
hew hebûya

38- Dergeh

Eger şev
Bêdergeh bûya
Ew dê roj
Ji ku bihataya

Û di dawiyê de
ew dê biçûya,
dema dergehên
şevê nebûya ?

39- Sê daxwaz

Min caran dixwest,
Bibûma xwedî serpêhatiyan
Mîna ku ez kal bûma
an jî
wilo zîrek
wek ku xwedî serpêhatî bûma
an jî bêkêmasî
wilo bi kêf
mîna ku ez zîrek bim
lê ez bawer im
ku ji ber wê çendê ye
ku ez ehmeq im.

(Ji http://www.reflectingarea.com/humans/erichfried/ashes.htm)

40- Toz

ez xweliya
agirê xwe me
yê ji êzingan
ez wisa biçûk dibûm
û min xwe radigirt,
wekî dema heşt salî bûm
û destên xwe
yên ez disotandim
ta ez li sariyekê
begeriyama
di xweliya
xwe de

41- li Hizra min î

Ez hizra te dikim
Û ne bikêf im?
Çima?

Karîna ramiyanê
Ne nekêfxweşî ye
Û bişên hizra te
Bikin
A te
Wek tu yî
A te
Wek tu xwe dilivînî
Hizra dengê te
Çavên te
A te
Wek tu xwe diyar dikî
Ew li kû ma
Ji bo
Rastiya reşiyê
(wek ez wê dinasim
û ew min dinasê)
û hîn jî di koçkê de
an jî di tengasiyê de.

(Ji www.user.fh-stralsunde.de/~swkajaeh/Erichfried.html)

42-Rêya Dibistanê a kevin

li vê kolanê
devera ku bilind
tehdîd didan
wan salên beriya ko bên
HÊDî -EZ DÊ JI TE RE ZANIBIM
Ez li bende nemam

Li wê kolanê
Dîsan bêdengiya dema bihurî
Tehdîd dike
Piştî wan salên
Ko buhurîn
HÊDî -EZ DÊ JI TE RE ZANIBIM
Ez dê li bende bim

Ev helbest a bi sernavê **Berî ez bimirim**, ji hêla nivîskara Elman, Beate Pinkerneil, hatiye şirovekirin û herweha di nav pirtûkekê de ko ji 100 helbestan û şirovekirinên wan pêk tê û ji aliyê rexnegirê Elman yê bi navê û deng Marcel- Reich Ranickî ve hatiye berhevkirin de weşiyaye.

Berî ez Bimirim

Careke, dipeyvin,
ji germahiya jînê,
bo hindek bizanibin!
Wî ne germ e,
lê dikare germ bibe

***

Berîka ez bimirim,
dubar e,
behsa evînê dikin
bo ku hindek bibêjin:
-Ew hebû
û pêdivî ye ku hebe

***

Careke din dipeyivin,
ji
kamîranî û bextê hêviyan,
li ser bext,
ji bo hindek bipirsin:
-Ew çi bû?
Kengî careke din
ew dê bizîvirê?!

Xweşbextiya hêviyan

Beate Pinkerneil

Erich Fried helbestvanekî, serhişk, bêcir, tundbaz û nerehet e, helbestvanekî Nago ye û di vê Nagoyê de, di ber comerdiya wî re herweha diyar dibe ko ew nikare di gel rê û resmên kevin de biguncê.

Fried di wê baweriyê de ye, ko mirov ji destpêkê de, destan di ber xwe re berde, û xwe sist bike, dê di dawiyê de jî nikaribe bîr û hizrên xwe bi azadî derbibire.
Fried bi **metirsî** bîr û behweriyên xwe di derbarî jiyan û cîhanê de eşkere dike.

Li vir, pirsek xwe di hiş û ramanên me de dibe û tîne ku ew jî ev e :
Mebesta Fried ji ***Destpêk*** û ***Hevguncînê*** çiye?
Eger em li helbestên polîtîk temaşe bikin, em dê bibînin ko ew sade, diyar, wekhev û bêperde ne ne. Agahî û hayedariya her destpêkekê, bêhest e, berxwedana di ber ker û laliyê de ye, û ev yek dawiyê helbestê tîne. Cenga ji bo bidawîbûna helbestê cengeke xerab e û nayê efûkirin. Û cenga li dijî bidawîbûna helbestê cengeke li dijî xinizî, neheqî û zordariyê ye, li dijî kulkêşanê û piçûkirinê ye.
Lewra Fried herdem piştgirê mirovên bindest, zorliwanhatî, jixwenebawer, mirovên li qoziya jiyanê radiwestin û mirovên têkçûyî û tengezar bû.

Tiştê Fried ji wan mirovên ko wî xebat di ber mafê wan de dikir cuda dikir ew bû, ko Fried cegerdar û mêrxas bû, li dijî gumanan bû û ji bo wê piştgiriyê zor cefa kişandibû, lê xwe sist nedikir, baweriya wî bi kar û barê wî hebû û digot: “ Buhayê zanînê êş e û azar e û bê êş û cefa têgihiştin û hişmendî çênabe. Ew hişmendî dengê êşê bi xwe ye »
Sinorê Erich Friedê Nago û bêcir ji yê xweştivî û dilovan û Ago cuda dike, ko ew parêzger û palpiştê hêviya û karê baş e, mirov e, zarxweş e. “ Dema em hêviyên xwe vemirînin, dê tiştên ku xofê bera dilên me didin jî her peyda bibin »

Şopa Christa Wolf di helbestên Fried de diyar in.
Hêviyên dudilyane, nebidestxistinê û binketinê di hişê Fried de diçin û tên, dilerizin, ew in yên zemînê xweş dikin, bo di hundurê deqê Fried de, mirin û azadî, bişaftin û hêz serî hilbidin.
Ez nikarim beramberî vê helbesta Fried tu helbestên din bibînim, ku bikare, watedar, sade û hêsanî be, bi gelemperî helbesta ko bi qasî ya wî ji westana jiyanê û xemgîniya wê, ji tirsê ta tuxûbê mirinê û gumanê, ilhes jî bi şêweyekî simbolîk derbas bike.

Fried di vê helbesta xwe, hevsarê xwe dide destê peyvê, wî navê tiştekî mukum bike, naxwazê hestan velorînê û bihedinîne, li lihevhatina peyv û hevokan û bi pey xweşkirina bi xwendevên nakeve. Wî navê xwêner bilerizînê, şa bike, bêgumaniyê berdewam bike. Ew dixwazê helbestê bi me xweş bike.

Peyama helbestvaniya Fried di kû de ye?

Ji awira pêşî diyar dibe ko temîniya wî, di xelasiya çêkirî de, di germiya jiyanê de, di evînê de ye, di xweşbextiya hêviyan de ye.
Belê em peyama wî di van hersê xalan de dibînin, herweha helbestvaniya wî jî.
Helbestvaniya wî ne tenê di şêweyê rasteqîne yê helbestê de ye, lê di niherîn, atmosfêr, daxwaz û karînên wî de ne jî.

Erich Fried, rastiyê rût û zelût bi ser me de digindirîne û me pê razmend dike.
Armanc û mebesta Fried ji wê hindê ye ko hezkirina mirovatiyê, hezkirina jiyanê di her mirovekî de bête çandin û weha jî, kok û rehên wî ji hêviyan e“.